Qurbana îda êzî 2006, canfidahî li Celle



Celle,12/2006. êndamên pêc–platforma êzîdiyên celle, bi heftiyan di xebata bo amadekirina cejna muqades, cejna îda êzî de bûn. civanên koma-dîlan, hûnermend û calakvanên îdê amadekariyên xwe dikirin. tev di wê baweriyê de bûn kû vê salê wê gelek betir mirov û bi taybetî civan tevlî cejnê bibin. Ji ber kû xebatên bi zanebûn û demokrat hedî hêdî nav civaka êzîdî li celle cihe xwe bi pishtgirtinê digre. **shêxê hêja canê xwe dikê qurban!** roj bi roj agahdariyên cûda dikevin destê me, car caran em bi van serpehatî/calakiyên civaka xwe, keyfxwes dibin û car caran mixabin zêdetir dilxemgin dibin. lê yekcaran ji serpêhatiyên taybet me dihejînin! di êvara îda êzî de bi rêz shêx nîhat tûlan, rahma xwedê li rihê wi be, canê xwe bo ol, civak û rumeta malbata xwe dike qûrban. **malbata rahmetî;** malbata rahmetî û bi taybetî bavê wî, bi rêz shêx mîrza tûlan, rumetparez, xêrxwaz û rusipiyekî civaka xwe ye! di rojên giran û destpêka damezrandina pêc li celle, vê malbatê pishtgirtiya me dikir û ji bo xebatên parastin û pêshxistina êzdiyatiyê li ser esasên demokrat û zanebûn, heta îro pishtgirtvanin. berî gelek mirovên zana, malbatê giringia komelek siyasetneutral û gorî demê femkir û parast. em hemû dayik û bavê rahmetî wekî parêzvanên shêxtiya rast û xwedenaz nazdikin. rahmetiyê nîhat tûlan xwedî malbat, mirov, zarok û xebatek gelek bash bû. qet tûcaran rahmetî mirov û civaka xwe acis nekirbû, hevalê hevalên xwe bû. laû, bra, bav, ap û xalekî dilovan bo mirovên xwe bû.

bila bishevitê mala-nezaniyê û feleka xayin; berî cend mehan serpehatiyek gelek zor hatibû serê malbata rahmeti. ev serpêhatî rahmeti tûcaran ne ji bo xwe û ne ji ji bo malbat û civaka xwe qebûl nekir! rahmetî gelek fikiri û zorî dikishand, lê disa ji nedixwest bi serê kesekî din wê serpêhatiye bo xwe û civakê careser biki. hertim di rojên resh û gran de isharet û calakiyên taybet derdikevin. hemû isharet bi destura xwedê û tawîsî-melek tên. car caran xweda milyaket an isharetan dishine rûerdê, car caran xwezahî isharetan dide û car caran mirov bi calakîyên xwe dixwazin hinek tishtan bi me bidin femkirin. calakiya canfîdahî ya brayê me nîhat tûlan dilê me gelek xemginkir, dil shevitand lê cavên gelek mirovên nezan û wenda wekir. ji me tevan re bi taybetî bo zarok û civanên me re tishtek got: **"xiyanetê bi ola xwe re nekin, xwe jibîr û wenda nekin, rumeta ol, civak û malbata xwe zanibin, kenê xwe bi hev nekin, xwe biparezin!"** dema derengî sevê em agahdar bûn, me hemû endamên xwe, bi telefonê bangî civinek taybetkir. hemû endamên pêc bi xemginî yekdeng bûn û gotin; **"em rahmetî û malbatê rumetparêz dizanin, calakî isharetêkî taybetê bo civak û civanên me, emrê xwedê hat – yên evda hilat, emê cejna îda êzî bidin rawestandin, emê îsal cejna xwe bi li xwe fikrandinê di malbata xwe de piroz bikin!"** ez, selim, gulê, ûsib û endamên komela me tev cûn cihê shînê, em tev gelek dilxemgin bûn dema me bi rêz shêx mîrza dit. dema xatir xestinê bi rêz shêx mîrza bo me got; **"brayê xelîl, brayê selim, 50 sal tên bira min, dure 3 bavik ango 150 sal me qet tucaran tishtekî ha nedit. Lê ez cewabikim? hindek mirov nerastiyê û xiyanetê qebûl dikin, lê em tishtên ha tucaran qebûl nakin, em nebashiye bo Malbata xwe qebul nakin!"**

xwendevanên hêja, hûn gotina êzdiyatîyê: **"em serê xwe didin–lê sirra xwe nadin"** nazdikin? rahmetî û bi rêz shêx mîrza dîsa rih dan wê gotinê, zindîkirin diroka serpehatiyên ola tawisî-melek. ez û selim gelek fikirin û xemgîn bûn, em bi gotina bi rêz shêx mîrza û qerara endamên komela xwe (pêc) gelek serbilind bûn. îd her sal dicin û tên, lê rihên pak û pakrevan dema dicin venagerin! **"êzdiyatî û xebat ne tenê parastin û pêshxistine, eû neqebulkirina gelek tishtane jî!" xwushk û brayên hêja, zarok û civanên delal,** daxaziya calakiya canfidahiyê bash binirxinin, bifikrin, bixebitin. li ol û civata xwe xwedî derkevin! Xebat û xwedîderketin, deyne me teva ye, parastina pêsheroja me ye! cavgirtin û bêdengî bo ol, civak û malbatê mirina reshe! **brayê hêja,** rahmetî shêx nîhat tûlan, em bejna xwe li hemberî xîret û daxaziya te û malbata te ditewînin. malbata te malbata me ye, bila xwedê û tawisî-melek malbata te bipareze. rahma xwedê li te bê, cihê te cinet be! hol hola siltan êzî yê sor e!

xelîl savucu, selim temin, 1/1/2007, navenda pêc e.v., pec-celle@web.de